Gulistan Bo Nûbûnê dipeyive

Amadekirin: Amîna Zikrî

Gulistan di warê stiran û mûzîka kurdî de navekê diyar û berniyas e ku mil bi milê hunermend Şivan Perwer, wan huner ji bo rizgariya gelê kurd terxan kiribû û yêdî bi dengê xwe yê şewat ji bo şoreş û serkevtina hetahetayî ya gelê kurd distirîn.

Li vê dawiyê Gulistanê sera Kurdistanê daye û pişikdarî di bîrhatina 60 saliya danana partî de kiribû û çend konsêrt li devera Duhokê bi vê helkevtinê gêra.

Da ku guhdarên wê, çendekê li ser boçûn û jiyana wê aşna bibin, ev kurte dîdar hat sazkirin. Di nêrîna Gulistanê de, stirana kurdî çawa ye? Dibêje:

Hunera me ji aliyê hunera gelêrî de, dewlemendiyek mezin di rojhelata navîn de heye... Ez dikarim bibêjim hunera kurdî di aliyê mûzîkê de ya herî bi hêze di nav mûzîka rojhelat de. Çima vê dibêjim? Ji ber ku dewlet nebûye û xwandingeh û zanko nebûne û bi gişti zimanê me yê nivîskî ji destê me hatiye girtin û hemû hêz ketiye ser dengî. Gava ez guhê xwe didime dengbêjan, stirana heryek ji wan xwandingeheke, romaneke, filîmeke.

- Tu nabînî mûzîka kurdî ya niho pitir çavlêkirine ku di biyavê rewşenbîrî û hunerî de gelek basê vê çavlêkirinê dihê kirin, em çawa dikarin resenatiya stirana kurdî biparêzin?

Hunermendên ku xwedî serborin, divê pitir çalak bin, berhemê xwe zû bînin der, rêkxistin di vî warî de hebe, divê em hunermend xwedî saziyên hunerî bin.

li Kurdistanê û bi alîkariya hukûmeta herêmê gereke ev tişt gelek hûr û dûr li ser bihê rawestandin û sazî çêbibin da stiran pitir cihê xwe bigire.

Heger me xwedî saziyên xwe çêkirin, ev dê bimîne li hindê ku me şareza di warê hunerê stiranê de yê ektîv nîne, di wî wextî de em pêdivî bi hindê dibin ku hindek kesanên biyanî me fêrî wê mûzîkjeniyê ya pozêşnel bikin, tu nabînî ev jî dê bibe çavlêkirin?

Me serbor hene û em ne hejar in, hunermendên baş û zîrek hene, di aliyê teknulojiya û rêkxistinê de mirov dikare ji ewropiyan mifay werbigire û wan organîze bikin, diravê wan bidinê û ew bo me kar bikin.

Destpêka hatina te bo nav stiran û muzîka kurdî kengî bû?

Ez ji malbatek kurdewarî û girtî têm, aliyê diya min Şêx in, aliyê babê min Mela ne, eşîr û axa, ez li bajêrekê mezin bûme, jin bi ebay derdikevin û dev û çavên xwe jî digirtin, jin na çin ber xwandinê, belê diya mij xazt ez biçim xwandingehê û xwandin û nivîsandinê fêr bibim, ez bûme 15 sal, êdî eşîra babê min rê nedan biçim û gotin ev kiç mezin bûye nabe êdî biçe xwandinê.

Ango, Gulistan di işqeka agirî de bûye, vêca Gulistan û işq li gel yek di çewanin?

Ez pitir kesatiyeka welatparêzim, erê min bi rastî jî Şivan bi dilê min bû ku min şû pê kirî, lê hem aliyê wê hebû, hem jî aliyê hindê hebû ku min zanî li gel wî dikarim xebatekê pê re bikim.. Anku eger Şivan neba, ez pê ra nezewiciyabame, hevalê min ne di vî karî de biya, Gulistanek çênedibû ku li pêş milletî stiran gotubiya.